Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan

Bernhard-Weiß-Str. 6
10178 Berlin-Mitte

u+ sAlexanderplatz

Senatsverwaltung für Bildung, Jugend und Familie ■ Bernhard-Weiß-Str. 6 ■ D-10178 Berlin

www.berlin.de/sen/bjf

Ji bo dêûbavên zarokên wan diçin kreşên Berlinê

17ê Tîrmeha 2020an

Agahiyên ji bo dêûbavan li ser xebata asayî ya tevahiya hêlînên zarokan ên rojê ya di dema pandemiya koronayê de

Stî û mîrzayên rêzdar, dêûbavên hêja,

ji 22.06.2020an ve hêlînên zarokan ên rojê yên li Berlinê piştî 3 mehên xebata acîl derbasî xebata asayî bûne; bi awayê tevgerîna li gorî şertên pandemiya koronayê û rêziknameya parastina ji enfeksiyona SARS-CoV-2. Em spasiya saziyên kreş û hêlînên zarokan ên rojê, bi taybet a rêveberên kreşan, dikin, ku dikaribûn bi awayekî serkeftî dest bi xebata asayî bikin û zehmetiyên, ku ji her kesî re barekî mezin bû, ji holê rakirine.

Hejmareke mezin a kreşan niha di amadekariya sala kreşê ya nû ya 2020/2021an de ne. Bi taybet gava hesaba sala pêş tê kirin, pirsên li ser rêxistinkirina xebata kreşê dertên pêş, ku çalakî dê dîsa piranî li hundir werin lidarxistin û nexweşiyên sermagirtinê dê dîsa zêde bibin.

Em ji dilekî germ ji we dixwazin: alîkariya kreşa xwe bikin, bi riya ku hûn li gorî tedbîrên diyarkirî yên ji bo kêmkirina pandemiyê tevbigerin. Alîkariyên wekî demên anîn û birinê yên li pey hev, teslîmkirina ji derve ve, kêmkirina pêwendiyên rasterast yên di navbera mezinan de, pêçandina dev û pozî û: gava zarokê we acîl nexweş bikeve, ji kerema xwe wî neynin kreşê. Bi alîkariya tevahiya van tevgeran hûn dikarin pêşî lê bigirin, ku zarok û xebatkar nexweş bikevin û ji ber vê jî hin kom ji hêlînê werin dûrxistin an jî hêlîn were girtin.

Di hefteyên borî de gelek pirsên ji malbat û hêlînên zarokan ên rojê hatin ji me re, ku dixwestin bizanibin ka pêwendiya bi zarokên wisa re dê çawa be, ku nexweş in, nexweşiya wan ne diyar e an jî nîşaneyên sivik yên nexweşiyê bi wan re diyar e, di rewşa rîskê de ne û li herêmên bi rîsk betlaneya xwe derbas kirine. Li ser vê bingehê em hin ji van pirsan dibersivînin, ku tê zanîn, di çarçoweya pandemiya Covid-19 de her car

agahiyên nû yên tibî tên ragihandin, ku divê mirov bi tevan baş haydar be. Ev bersivên li jêr jî li gorî agahdariyên bingehîn yên herî nû ne hatine amadekirin.

Zarokên bi nîşaneyên nexweşiyê:

Hete niha çawa be, gelemperî hêj jî wisa ye, ku divê zarokên nexweş ketine neçin kreşê ango lênêrîna hêlînî negirin. Ji kerema xwe re bizanibin, ku divê hûn di derbarê nexweşketina zarokê xwe de agahî bidin kreşê. Gava nîşaneyên enfeksiyona riya bêhnstandinê ya acîl bi zarokê we re xuya bibe, ku wekî nîşaneyên nexweşiya Covid-19 tê zanîn, nabe ku zarokê we here kreşê. Nîşaneyên bi vî rengî hebin: êşa laşî, serêşiya dijwar, jitaqetketin, taya sar, taya germ, bêhntengî, bêhnnegirtin an jî tamnegirtin. Gava zarokê we li kreşê nexweş bikeve, ji kerema xwe re zarokê bi lez ji kreşê bibin. Bi riya testeke pêkan doktor an jî saziya tenduristiyê biryar li ser dide.

Ji bo zarokê we piştî enfeksiyona riya bêhnstandinê dîsa li kreşê were qebûlkirin, divê teqez agirê zarokî berdewamî derneketibe. Dibe ku kreşa we di rewşeke wisa de ji we bixwaze, ku hûn teqez bikin (bi nivîskî), ku di 48 saetên dawî de hîç nîşaneyên nexweşiyê pê re çênebûne. Ji bo dîsqebûlkirina zarokê we peleke ji doktorî yan jî radestkirina encamên testê ne pêwîst in.

Lê belê gava zarokê bi awayekî teqezkirî bi nexweşiya Covid-19 ketibûbe, hingê beriya dîsqebûlkirinê bo hêlînê divê hûn peleke doktorî radest bikin, ku diyar dike, zarokê we dikare dîsa here kreşê, ji ber ku metirsî li ser belavkirina enfeksiyonê tune ye.

Cudahiyek di navbera enfeksiyonên riya bêhnstandinê ya acîl û nexweşiyên sermagirtinê yên ji rêzê de heye, ango zekemîketin an jî quxîna **bê** taya germ û nîşaneyên nexweşiyên din, ku li jorê hatine diyarkirin ne wekî hev in. Di rewşên wisa de hîç sedemeke berbiçav tune ye, ku kreş ji destpêkê û vir ve qebûl neke, ku zarokê we were kreşê yan jî ji mafê lênêrtina zarokan sûdê bigire. Ji kerema xwe re van pirsên li pêş ji xwe re bibersivînin: Hîç sedemek heye, ku hûn bikevin nav gumanan, ku zarokê we belkî bi nexweşiya Covid-19 ketibe? Pêwendiya wî bi kesên nexweşketî re çêbûye? Hûn an jî zarokê we çûne herêmeke bi rîsk? Ji kerema xwe re bi kreşa xwe re di derbarê van xalan de biaxivin, ku ew ê jî bi awayekî çalak bi we re mijûl bibin. Gava hûn di dudiliyê de bin, xwe bigihînin saziya tenduristiyê ya herêma xwe.

Enfeksiyona di nav malbatê de:

Heger di nav malbata we de enfeksiyona Covid-19 hatibe diyarkirin, destûra zarokê we tune ye, ku here kreşê. Heger pêwendiya zarokê we bi kesên enfektegirtî re çêbûbe û hêj 14 roj di ser re derbas nebûbin, heman tişt hingê ji bo vê yekê jî derbas dibe. Gava hûn an jî endamekî din ê malbatê li benda encama testê be, ji ber ku bi kesekî enfektegirtî re pêwendî danîbû, lê belê li gel wî kesî hîç nîşaneyên nexweşiyê xuya nebûne, dîsa jî zarokê we nikare li kreşê ji mafê lênêrtinê sûdê bigire.

Zarokên di komên bi rîsk de:

Gava zarokê we ji ber nexweşiya xwe ya berê ya taybet, ku bi nexweşiya Covid-19 bikeve, xetereyeke gelek dijwar ji bo wê pêkan be, hingê divê hûn û kreş ji xwe bipirsin, ka ji bo lênêrtina wî zarokî di şert û mercên çawa de pêk were. Ev yek dikare bi nirxandina taybet û hevxebata di nav bera we, kreşa we û doktorê/doktora zarokî de were çareserkirin. Dibe ku di belgeya doktorî ya li ser tenduristiya zarokî de agahdariyên di derbarê tedbîrên pêwîst yên parastinê de hebin. Gava di rewşa nû de guman an pirs hebin, ji ber ku divê were zelalkirin, ka zarokê we dikare here kreşê, hingê kreşa we beriya ku zarokê we dîsa qebûl bike, dikare ji we bawernameyeke doktorî bixwaze.

Kesên ji herêmên bi rîsk vegeriyane:

Di rêziknameya parastina ji enfeksiyona SARS-CoV-2 de şertên di qanûnên §§ 8 û hwd. de ji bo kesên ji herêmên bi rîsk vegiryane derbas dibe. Gava li hermênên di nav Almanyayê de û li derveyî wê rîskeke bilind a nexweşîgirtinê hebe, hingê ew herêm wekî herêmên bi rîsk tên qebûlkirin. Herêmên bi rîsk li ser malpera Enstîtuya Robert-Koch tên parvekirin:

www.rki.de/DE/Content/InfAZ/N/Neuartiges_Coronavirus/Risikogebiete_neu.html

Heger mirovên ku di nav 14 rojên beriya ku werin welatê Berlinê de çûbin herêmeke bi rîsk, divê ew 14 roj bikevin karantînaya navmalê û bêyî dem di ser re derbas bibe, ew saziya tenduristiyê ya peywirdar agahdar bikin. Ev rêbaz ji bo van kesan derbas nabe, ku bi wan re bawernameyeke nû ya doktorî û encamnameyeke nû ya laboratuwarê hene, ku diyar dikin ew bi nexweşiya Covid-19ê neketine. Bawernameya doktorî û encamnameya laboratuwarê divê radewstî saziya tenduristiyê ya peywirdar werin kirin. Saziya tenduristiyê êdî biryar dide, ka şertê karantînayê pêwîst e yan jî na. Heman rêbaz ji bo zarokên we jî derbas dibin. Gava şertê karantînayê ji bo zarokê we hatibe dayîn, hingê ew nikare li kreşê ji mafê lênêrtinê sûdê bigire.

Dêûbavên hêja, ji kerema xwe re gava pirs, xem an jî agahdariyên we hebin wekî berê di demên pêş de jî xwe bigihînin nûnerên xwe yên pêbawer yên hatine hilbijartin an jî komîteya dêûbavên a welêt a hêlînên zarokan ên rojê (info@leak-berlin.de). Helbet em ê di demên pêş de jî agahiyên li ser pêşketinên nû de bidin we.

Hûn dikarin vê agahiya ji bo dêûbavan, paşê bi gelek zimanên din jî, li ser malpera Rêveberiya Senatoya Perwerdehî, Ciwan û Malbatan di lînka li jêr de bibînin:

https://www.berlin.de/sen/bjf/coronavirus/aktuelles/schrittweise-oeffnung-kita-und-kindertagespflege/

Li gel silavên germ
Peywirdar
Carsten Weidner